Werger ji bo pêşdebirina ziman û edebiyata me ya nivîskî pir giringe

Sidqî Hirorî

Wergêran yan werger, ji bilî ku pireke di navbera Kurdistanê û derve, serbor û afirandinên nû, kulturên din, berhemên din yên derve yên di her warekî de, ew her weha pêwîstiyeka fere ji bo gelek waran û ji wan:
- Dewlemendkirina zimanê me
- Pêşdebirina nivîskarî û afirandinê û tevgera hizr û ramanê.
- Dewlemendkirina pertukxaneya kurdî
- Berdestkirina bêtir jêderên xwefêrkirin, xwemijûlkirin, zanistî û hwd.

Ziman di bikaranîna xwe ya rojane ya di hemû waran de û di zêdebûna warên bikaranînê de sax dimîne. Berdewamiya zindîbûna zimanekî jî girêdayî hindêye ka ew çend berfereh têt bi karanîn û çawa bersiva pêwîstiyên jiyana rojane ya serdem ya kes û civakekê û pêwîstiyên wan yên di nav sinor û derveyî sinorên wan dide.

Wergêran di vî warî de alîkarekê pir giring û mezine hem ji bo dewlemendkirina wê mijara werger pê ve mijûl dibe û hem jî zimanî ku bi wan nûyatiyên di zimanê jê wergerandî de dewlemend û serwext dibe. Mebesta min ji wergerê ne bes warekê taybetiye, wergera di warekî bi tenê de ye, lê wergera girêdayî hemû waran; yên edebî, zanistî, civakî, aborî û htd. di heman demê de ye.

Çawa mirov bi rêya temaşekirina kenalên televizyonî yên derve, bi rêya satelîtan, hînî gelek tiştan dibin, yan agehdariyan li ser gelek tiştan distînin ku di civakên wan de nebin yan ne bi wî rengê li cem

wan bin; bigire ji muzîk, govend, cilûberg, teknolojî, kultur û hwd. ew her weha bi rêya wergera nivîskî ya ji zimanekê din bo kurdiyê asoyeka berferehtir ji peyvsazî, dariştin, teknîka nivîsîn, form û hizran bi dest dixin.

Kurdiyê û ji kurdiyê jî kurmanciyê gelek pêwîstî bi wergera di her warekî de heye. Pertukxaneya me ji bilî di warê folklor, helbest û niha jî çîrokê de, ew di warên din de gelek hejare. Zimanê me di her warekî de ji bo ku di şergeha manê de serbikeve li benda bêtir nivîsîn û dahînana bi kurdiyê ya di her warekî de ye, zimanê me pêwîstî bi dewlemendkirineka berdewam heye û ew jî zû, di rewşa me kurdan de bi rêya wergerê çê dibe.

Ji bo kurdiyê di demê niho de hezar pertuk di salekê de têrê nakin û belavkirina bes pertukên edebî sewiyeya zimanî û dahînan û afirandina bi kurdî bilind nakin û nagehînin astê bersivdana pêwîstiyên takekes û civaka me yên vê gavê û suberojê. Heger wek niha werger bimîne bi hêviya kesan û wergerandina wan ya carûbaran, ya ne organîzekirî ya ew bes di wextên xwe yên mijûlahiyan de dikin, dê gelek alîkar nebe. Pêwîstiya me di rewşa kurdiyê û bi taybetî ya kurdiya kurmancî de bi wê heye ku dezgehên taybet yên kurdî; çi mîrî û çi jî bazirganî pûte bidin wergerê û ew xwe bi plan û nexşe û budcetên baş bidin ber vî karê pir wecdar.

Werger ne bes giringe ji bo dewlemendkirina zimanî û babetê wergerê û berdestkirina bêtir berhem û jêderan, lê ew gelek giringe ji bo pêşdebirina mirovê me û tevgera hizirkirin, behremendî, afirandin, nivîskariyê û di encamê de pêşdexistina xelk û civakekê. Dewlemendbûna wergera di her warekî de dê ziman û dahînana edebiyata bi kurdî jî zengîn bike û pêşde bibe.